



**Rhophylac**<sup>®</sup>

Mehlûla Antî-D ya Îmonoglobûlîna mirovî  
Ji bo derzîlêdanê li sirenga amadekirî, 1500 IU

**Agahiyên têkildarî pêşîlgirtin li Rhesus'ê (Rh)**

# Çima tu ketiye bin dermankirina bi Rhophylac'ê\*

(Antî-D ya Îmonoglobûlîna mirovî)?


## Pêkanîna elwehiyê ya RH'ê

Rewşa her kesekî ciyawaz e û di encamê da, mirovan taybetmendiyên xwînêyên ciyawaz hene. Bi giştî me çar komên xwînê hene ku li gorî taybetmendiyên selûlên xwînê tên diyarkirin. Yek ji hokarên diyar ên girîn di xwîna me da "Hokara Rhesus" (Rh) e ku di globolên sor ên xwînê da tê dîtin. Mirovên bi Rh'a erênî di asta globolên sor ên xwe tiştêkî bi navê Antî-D hene. Di mirovên bi Rh'a erênî, Antî-D'yê di asta globolên sor hene. Koma xwînê û hokara Rh'ê ji dêbavan wek mîrate digihêje mirov. Li Ewropayê, derdora 85% ji mirovan bi Rh'a rênî û derdora 15% ji wan bi Rh'a nerênî ne.

## Yekemîn ducanîbûn

Di heyama ducanîbûn û zarokanîne da, bi vekolandina hokara Rh'ê mirov dikare diyar bike ku gelo dayîkek bi Rh'a nerênî dikare zarokeke bi Rh'a erênî bîne dinyayê an na. Ev bûyer tenê di rewşekê da diqewime ku bavê zarok bi Rh'a erênî ne. helbet hemî bavên bi Rh'a erênî tekez dê xwedan zarokê bi Rh'a erênî nebin.

Di heyama ducanîbûnê da, cot rê li ber tevlihevbûna globolên sor ên dayîk û cenînê (zarokê di zikê dayîkê da) digire. Helbet, carinan qaseke hindik a xwîna cenînê dibe ku derbasî xwîna dayîkê bibe.




Eger hucreyên xwînê yên cenîna Rh'a erênî derbasî xwîna dayîka bi Rh'a nerênî bibin, leşê dayîkê renge bi berhemanîna antîbodayê bertek nîşanî antîjena D ya xwîna cenînê wek materyala derveyî bide. Ji vê pêvajoyê ra Pêkanîna Ewlehiyê ya Rh'ê dibêjin. Ev mijar bi giştî di yekemîn ducanîbûnê da kêşeyekê pêk nayîne, lê renge di ducanîbûna din da dûhatine cidî bi xwe ra bîne.

Bi taybet, hucreyên xwînê ya cenînê dema zarokanînê bi xwîna dayîkê ra dikevin peywendiyê. Helbet, ev bûyer renge di her qonaxeke ducanîbûnê da, wek mînak di pêvajoya jiberçûna cenînê ya xwestî û nexwetî da, am di rewşa qewimîna rûdanên nasyar ên heyama ducanîbûnê weke amniocentesis, testa placenta'yê, xwînhatin an Trûmaya zik biqewimin. Ev rûdan ku renge rewşê ji bo berhemanîna antîbodayê li hemberî antîjena D di leşê dayîk da xweş dikin, wek rûdanên ihtimalî yên Pêkanîna Ewlehiyê tên naskirin.

### Ducanîbûnên din

Bi giştî, zarokê yekem ku rewşê ji bo vê pêkanîna ewlehiyê xweş dike, di bin bandora rûdanên nebaş da nakeve, ji ber ku berhemhatina antîbodayê piştî hatina dinyayê ya zarok dest pê dike. Helbet, eger duyemîn zarokê dayîkê bi Rh'a erênî be, antîbodî renge derbasî xwîna cenînê bibe û li ser globolên sor ên cenînê bandor bike. Ev rewş wek nexweşiya haemolytic a cenîn an zarok (HDFN) tê gotin.



Eger zarokên din jî bi Rh'a erênî bin, dê berteka li hemberî antîbodyê pirranî bilez û giraniyeke zêdetir bin.

Bi alîkariya pêvajoya pêşîlêgirtina Rh'ê bi Îmonoglobûlîna Antî-D, îmkana pêşîlêgirtina guncan a pêkanîna ewlehiyê ya Rh'ê di heyama ducanîbûnê da û zarokanînên din hatiye dabînkirin.

## **Pêşîlêgirtin li Rh'ê bi Rhophylac'ê\***

Mebest ji "Pêşîlêgirtin"ê nivîsîna destûra dermên ji bo pêşîlêgirtin li qewimîna rûdaneke nexweş e. Pêşîlêgirtin li Rh'ê an Antî-D pêkanîna ji nivîsîna dermên, derbarê te, Rhophylac® - pêkhatî ji Îmonoglobûlîna Antî-D bi armanca pêşîlêgirtin ji berhemanîna antîbodyê di bedena leşî ji bo sekinîna li hemberî hucreyên xwînê yê Rh'a erênî û di encamê da pêşîlêgirtin ji tûşbûna cenînê bi nexweşiya haemolytic'ê ye . Bandora pêşîlêgirtinê ya Îmonoglobolîna Antî-D tenê heyameke kurt dewam dike û derman divê di heyama ducanîbûnê da û piştî her cara ducanîbûnê da dubare bibe. Rhophylac® bi riya derzîlêdana li masûlkeyê (derzîlêdana nav masûlkeyê) an li Şademarê (derzîlêdana nav-demarî) derbasî leşî dibe.

## Di heyama ducanîbûnê da

Bi giştî dermanê pêşîlêgirtinê bi Rhophylac® ji bo hemî jinên ducanî yên bi Rh'a nerênî ku Pêkanîna elwehiyê derbarê wan pêk nahetiye (di leşê xwe da antîjena D tunene) tê pêşniyarkirin. Ev derman di nobeteke navbera hefteyên 28 û 30 yên ducanîbûnê da tê derzîlêdan.

## Piştî zarokanîne

Piştî jidayîkbûna zarok, testek ji bo diyarkirina koma xwînê pêk tê. Eger zarok bi Rh'a erênîbe Rhophylac®, bi giştî di heyamka sê rojan ji roja jidayîkbûna zarok, derzî li dayîkê tê xistin. Ji vê pêvajoyê ra Pêşîlêgirtina piştî zarokanîne tê gotin.

## Dûhatên heyama ducanîbûnê

Di rewşa qewimîna rûdana ewlehîsaz – wek mînak her yek ji babetên jêrê – Mama an bijîşk li dermangeha beriya zarokanîne, renga kiryarên guncan pêk tîne:

### 1. Hebûna ihtimala jiberçûna zarok a rasteqîn

pêwîstî bi destwerdana nîştergeriyê, an jiberçûna cenîne piştî hefteya 12an a ducanîbûnê

### 2. Ducanîbûna derveyî-malzarokê

an jî jiberçûna zarok bi nîştergeriyê

### 3. Xwînhatina vajînal a giran piştî hefteya 12an a ducanîbûnê

### 4. Pêvajoyên zarokanîne, wek mînak testa Cotê, amniocentesis an zivirandina ji derve,

### 5. Derba giran li zik, wek mînak ji ber ketina li erdî an bûyerên li cadeyê

Loma, di rewşa qewimîna bûyerên weke xwînhatina vajînal, pêwîst e ku mijarê herî zûtir ji Mama an bijîşkê çalak di dermangeha Pêş-zarokanîne da bibêjî.

## Gelo hemî jinên bi Rh'a nerênî hewcetî bi pêşîlêgirtinê hene?

Di hinek babetan da, pêwîstiya vî demanî ji nav diçe:

- Eger piştrast bî ku êdî tu yê ducanî nebî (wek mînak piştî stwarkirinê)
- Eger ducanîbî û piştrast bî ku bavê zarokê te yê pêşerojê bi Rh'a nerênî ye. Di vê rewşê da, zarokê pêşerojê dê bi Rh'a nerênî be.

Ji bo wergirtina agahiyên zêdetir di gel bijîşk an dermangeha Pêş-Zarokanîne bikeve têkiliyê.

### Ji bîr neke!

Di heyama ducanîbûnê da, divê têkiliya di gel bijîşk an Mama biparêzî. Ev karzan dikarin rewşa xwînê û koma Rh'a te diyar bikin. Agahiyên têkildarî Koma Rh'ê yên te li dosyeya nexweş tîn tomarkin û tu divê vê dosyeyê rabe dermangeha jin û zarokanîne bikî. Eger dubare ducanî bibî, pêwîst e ku raboriya werguirtina Îmonioglobûlîna Antî-D ji brpîrsên têkildar ra ragihînî.

**Dema wergirtina Rhophylac® binivîse û li civîna lênêrîna dewreyî, di heyama şeşe mehên destpêkê yê piştî ducanîbûnê da û di her yek ji civînên Lênêrîna ducanîbûna nû da, raberî bijîşk an Mama bike.**

Nav

---

Kodenava Kesane (ID)

---

**Dermankirina bi Rhophylac'ê® (Anti-D'ya Îmonoglobûlîna Mirovî)**

Roj

---

Nexweşxane

---

Raberkera xizmetên Mirovî

---

Roj

---

Nexweşxane

---

Raberkera xizmetên Mirovî

---

Vê belgeya agahiyên dikarî ji CSL Behring AB'ê werbigirî. Ji bo wergirtina agahiyên zêdetir, serdana belgeya agahiyên nexweş bike. Tu dikarî vê belgeyê ji bijîşk an Mamayê xwe daxwaz bikî.

## Agahiyên bijîşkî yên broşûrê ji aliyê şêwirmendê ducanîbûn û zarokanîne, Gunilla Ajne, ji nexweşxaneyê fêrkirinê ya Karolinska'yê li Huddinge'ê hatine vekolandin.

**RhophylacMehlûlka**® 1500 IU (300 µg) ji bo derzîlêdana nav-masûlkeyî an nav-demarî li sirenga amadekirî. Îmonoglobûlîna Anti-D'ya mriovî Ev mehlûl pêkhatî ji proteyînên taybet ên bidestxistî ji Plasmaya mirovî (beşa şilavî ya xwînê) ye. Ev proteyîn ji destyê "Îmonoglobûlîn" (Djeleş – Antibodî) in. Hokara çalak a Rhophylac cûreyeke taybet a Antîbodyyê bi navê "Îmonoglobûlîna Anti-D (Rh)" e. Îmonoglobûlîna Anti-D li dijî hokara Rhesus'ê ya ji cûreya D disekine. Rhophylac ji bo jinên bi Rh'a (D) nerênî ku cenîna wan bi Rh'a (D) erênî ye, tê nivîsîn û destûrkirin. Ev derman ji bo jinên ducanî bi Rh'a (D) nerênî ku erênîbûna Rh'a (D) zarokê wan hîn diyar nîne, jîtê nivîsîn. Rhophylac divê bi destê bijîşk an karzanê tendurustiyê were derzîkirin. Rhophylacenge bibe sebeba qewimîna berteka zêde-hestyarî (berteka Hestyariyê). Di rewşa qewimîna vê cûreya bertekê, mijarê derdem ji bijîşk an karzanê tendurustiyê ra bibêje. Belgeya agahiyên a nexweş bi baldarî bixwîne. CSL Behring AB, telefon: +46 8-544 966 70. Ev belgeya agahiyên li gorî belgeya agahiyên nexweş ya roja 6ê Îloan 2019an hatiyê amadekirin.

**CSL Behring**  
Biotherapies for Life™

CSL Behring AB  
Berga Backe 2  
SE-182 17 Danderyd  
Telefon: +46 8 544 966 70  
Faks: +46 8 622 68 38  
[www.cslbehring.se](http://www.cslbehring.se)  
[info@cslbehring.se](mailto:info@cslbehring.se)